BÊOMÊDIYA JINÊ DI NAV CIVAKÊ DE

Kurdistan Çavşîn

Civak, ji komeka mirovan pêk dihê ku girêdayî hindek dab û nerîtan in û li ser parçeyeka erdî dijîn û jîngeheka taybet li derdorên xwe heye. Li her civakekê mirovan hîvî û omêd hene û dê bizavan ji bo bi destvehînana wan hîviyan bike. Lê gelek caran ev hîvî û xwezî ye ji ber egerên civakê yên rêgir nahên bi cihînan.

Ta niho kiça kurd neşiyaye xwe bike xudan biriyar û herdem ji civakê xwe tirsiyaye û neviyaye kesek bi şaşî behsê wê bike, ev jî bûye eger ku mezintirîn hîviyên xwe ji dest bide. Fere kiçên kurd danpêdanê bi şaşiya xwe û xêzan û civakê xwe bidin da bişên wê perdeya reş a gelek hîvî herifandîn rabikin û perdeyeka spî dabinin ber çavên xelkekî. Rast e gelek kiç dê bine qurban, lê her çawa be dê qurbaniya wan bibe palderek û dergehek bo kiçên ji nû digehin. Bi rastî xweveşartina kiça kurd li pişt perdeya reş, em dişên bibêjin di cihê xwe de nîne, lê eger bi rengekê giştî berê xwe bidine civakê xwe dê gelek arîşe bo me peyda bin ji bo rakirina vê perdeya reş.

Gurey hêz û şiyanên kiça kurd rê nahête dan bo vê kiçê da ku şiyanên xwe ber çav bike, arîşeya serekî girêday xêzanê ye û divê xêzan li destpêkê xwe ji civakê qurtal bike û paşî dê şêt rê bide kiçên xwe ku pişên hîviyên xwe bi cih bîne û ne bi tinê kiça kurd dinale, belê kur jî gelek caran tûşî van arîşeyan dibe, çunke eger dem hat genc xewin û hîviyên xwe bicih bîne û nêzîkî arezûya xwe bibe divê berheviyeka baş kiribe û hemû hêz û şiyanên xwe yên hizrî û leşî amade kiribe ku bişêt bi şêweyekî serkevtî karê xwe encam bide. Lê mixabin eger li despêkê rê li hîviyên mirovî hatine girtin, bi taybetî ji layê xêzanê ve, arîşeyeka êkcar mezin e. Bêgoman arîşe dê di navbera xêzanê de peyda bibin û eger hîviya mirovî ya serekî hate ji

navibirin, dê bine egerê hindê mirov desta ji her karekê dîtir berde û sisitî û bêhêziyeka mezin dê bikeve di jiyana mirovî de û êdî jiyan dê li pişt çavan reş bibe û hemû hîvî dê ber bi nemanê ve çin, çunke civakê me yê (eşayrî) ye, ayînê îslamê ta radeyekê azadiya kiçê tuxîbkirî ye û ji ber ku kiça kurd bi xwe jî harîkar nîne lewma ev reş hatiye pêş.

Divî babetî de ev xal e di giring in:

nebûna azadiyê di nav civak û xêzanê de kartêkirinê li derûnê mirovî dike ku bihête bê behirkirin ji paşerojê.

bîr û boçûnên kevin kartêkirin li kur û kiçan di nav civakê me de kiriye nemaze ji layê xêzanê ve, ev genc e di jiyanê de her lawaz in û di rastiyê nagehin, wek dupatkirin li kurî bo destnîşankirina hevjînê bi haneya hindê ku kurê me êkane ye û divê zû jinê bo bînin. Yan jî xurtîkirin li ser kiçê ku bidine kesekê li dû dilê Yan jî xortîkirin li ser kiçê ku bidine kesekê li dû dilê xêzana wê bila xwe heke yê pîr bibit jî. bibit jî

Lawaziya astê têgehiştinê û rewşenbîriya dayk û baban ku di ncam de dergehê zanînê û ronahiyê li kiçê digirin dê bêjin şerm e kiç bi çit bi xwe bîne û dê ji ber dest derikeve heke piştî xandinê qesta gurepana karî kir

derfet nedan dinav xêzanê da ku kiç wekî kurî derbirînê ji hest û bîr û boçûnên xwe bike.